

**MEDRESE GELENEĐİ VE
MODERNLEŐME SÜRECİNDE
MEDRESELER**

ULUSLARARASI SEMPOZYUM

التراث المدرسي الشرعي والمدارس الشرعية في مواجهة مسار الحداثة

**MADRASAH TRADITION AND
MADRASAHS IN THE PROCESS OF
MODERNIZATION**

**KEVNETORA MEDRESEYÊ
Û
DI PÊVAJOYA MODERNBÛNÊ DE
REWŐA MEDRESEYAN**

5-7 Ekim / October 2012
MuŐ Alparslan Üniversitesi
MuŐ / TÜRKİYE

M.Ş.Ü. YAYINLARI -1-

1. cilt isbn: 978-605-5137-01-4

Kitap Adı

Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler

Editör

Yrd. Doç. Dr. Fikret GEDİKLİ

Son Okumalar

Yrd. Doç. Dr. Hüseyin DOĞAN
Yrd. Doç. Dr. Mehmet DALKILIÇ

Dizgi

Yrd. Doç. Dr. Fikret GEDİKLİ

Kapak Tasarım

Erdal YILDIZ

Baskı/Cilt

-2-

1. Baskı

Mayıs 2013, Muş

Bu eserin bütün hakları M.Ş.Ü'ye aittir.
Yayınevinin izni olmaksızın, kitabın tümünün veya bir kısmının elektronik, mekanik
ya da fotokopi yoluyla basımı, yayımı, çoğaltımı ve dağıtımı yapılamaz.

İsteme Adresi

Muş Alparslan Üniversitesi
Tel: 0436 213 00 59 – Fax: 0436 213 00 59
www.alparslan.edu.tr

Di Medreseyên Rojhelatda Perwerdehîya Bi Zimanê Kurdî û Çend Berhemên Kurdî Yên Bijarte

Arş. Gör. Metin YILDIZ¹

Medrese kelîmeyeke 'Erebîye, wate (me'na) ya wî jî, cihên ku tê da ders tîn dayîne ye. Bingeha medreseyên Rojhelata Anatoliyê wekî medreseyên her aliyê cihana Îslamê xwe digihîne dema Rasulullah (s.x.s.). Xebitandina kelîmeya medresê di dema Selçuqîyanda destpêkirîye.² "Di Kurdistanêda pergela perwerdehîyê bi Îslâmê ra bu Îslâmî. Dibistanên olî ku cîyên wekî *medrese* tîn zanîn bune cîyên perwerdehîya bingehîn... Mizgeft û medrese cîyên perwerdehîyêne."³ Çalakî (fe'elîyet) û tevgerên medreseyên di Rojhelata Anatoliyêda digîje dema Nîzamu'l- Mulk.⁴ Di medreseyande perwerdehîya olî serîda, ya hendese, tibê, astronomî... û hwd. jî hatiye dayîne⁵.

Perwerdehi, serê her tiştî de bi diyalog û fêmkirinê çêdibe. Diyalog û fêmkirin jî bi navgînan dibe. Navgîn (vasit) a herî girîng jî ziman e. Perwerdehîya biziman ne wekî perwerdehîya bê ziman e. Lewra, di perwerdehîyê da giringîya ziman balkêş e. Çawa her derî perwerdehî bi zimanekî hatiye dayîne, di medreseyên rojhelatda di despêkê da heya van salên dawî perwerdehî bi piranî bi zimanên deverê hatiya dayîn. Dema ku em diroka medreseyân dinihêrin dewlemendîyek e balkêş bala me dikşîne. Deverên kîjan zimanî bikaranîn zehf bûye perwerdehî jî wî zimanî hatiya dayîn. Mijara me ku ser medreseyên rojhelatda ye, emê jî xebata xwe li ser medreseyên rojhelatda bisînorkin. Çawa ku tê zanîn berîya avakirina Komar a Tirkîyeyê, dema Osmanîyanda perwerdehî bi zimanên herêmî dihate dayîn. Wê demê herêm

1 Muş Alparslan Üniversitesi İlahiyat Fakültesi

2 Mela Birhanê Tarîni, *Medrese Ji Her Aliyê Ve Medreseyên Me*, r. 15.

3 Mehmet Uzun, *Kürt Edebiyatına Giriş*, r. 36.

4 Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 33.

5 Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 104.; Mela Birhanê Tarîni, *Medrese Ji Her Aliyê Ve Medreseyên Me*, r.17.

a rojhelatda cur bi cur netew hebûn û wan neteweyan bi zimanê xwe perwerdehî ditîdin. Medreseyenda jî zimanê perwerdehîyê piranî zimanê kurdî buye û vêgavê jî tê domandin. Lê belê dema ku xandevan zimanekî din bizanibe û seyda jî zimanê wî xandevanî bizanibe wê demê seyda zimanê wî xandevanî perwerdehiya wî dide. Mînak, xandevan Tirk be ders bi Tirkî, Zaza be bi Zazakî tê dayînê.⁶ Medreseyên rojhelatda hîndekarîya pirtûkên ‘erebî jî pirayî bi zimanê kurdî tèn kirinê. Tiştêkî balkêş jî seydayên ne kurdin jî bi zimanê kurdî dersan didin. Wan salên dawîyêda di medreseyanda carnan li perwerdehîke pîrzimanî tê domandinê.

“Medrese bi alikarîya gel va, bi taybetî di sala 1923’ yan dûv re bê alikarîya dewletê bi serê xwe xizmetên xwe berdewamdikir. Lêbelê li bin şert û mercên pir giran da ifâ-î wezîfa xwe dikir.”⁷ Çend sal piştê damezrandina Komar a Tirkîyeyê tiştên nexweş û tundî destpêkir. Çand û bawerîyên gel hatin qedexekirin. Hetanî bang a şerîf bi zimanê tirkî tê wergerandinê. Zimanên bilî tirkî tèn qedexekirin. Lê tiştêkî girîng û balkêş heye ku perwerdehîyên medreseyan bêfermî wekî di bin erdê da tê berdewamkirin. “Di dema avakirina Komarê da, bi nizîkayî, hetanî dawîya salên 1960 î yan, perwerdehî û çalakîyên herêmê bi saya medreseyan da berdewamkirîye.”⁸ Wê berdewamkirina perwerdehîyên medreseyan da zimanê kurdî jî derfetên berdewamkirinê ditiye. Zimanê kurdî, “... di Kurdîstan a Tirkîyeyêda bê alikarîya fermî, heta tevî qedexekirin û zordestîyên salên dirêj, sedan salin di raman (tefekkur) a Îslâmê bi serî da, di warên çand û wêjeyê da wekî zimanê medreseyê bikevneşopeke zimanê qedîmî tê berdewamkirinê.”⁹ Li vêderê gengaz (mimkun) e ku mijareke ku têkilîya wî, bi vê mijarê ra heye were rave (îzah) kirin. Ev mijar jî ev e ku Mela Birhanê Tarînî di pirtûka xwe ya bi navê *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyên Me da* dibêje ku: “Lê zanayên me yên ronahîweşên û tijî ‘ilm li zimanê xwe nebûne xwedî. Xebatên wan li her derê û her tim Îslam bûye, bi qasî ku qîmet dane ziman û wêjeya ‘Ereban, qîmet nedane zimanê xwe. Bi qasî ku zimanê bîyanîyan dewlemend kirine, zimanê xwe qet dewlemend nekirine. Heke bikirana, wê zimanê Kurdî îro li cîhanê yekgirtî bûya û wê navneteweyî bûya.”¹⁰ Rûpeleke din da ji Mela Birhan wuha nivî-

6 Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 84.

7 Halil Çiçek, “Yakın Tarihimizde Doğu ve Güneydoğu Anadolu Bölgelerinde Din Eğitiminin Rolü”, *Sosyal Bilimler Kavşağında Doğu Anadolu Sempozyumu*, 1999, Van, di nav pirtûka *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 195.

8 Halil Çiçek, “Yakın Tarihimizde Doğu ve Güneydoğu Anadolu Bölgelerinde Din Eğitiminin Rolü”, r. 218.

9 Hasan Postacı, “Yeni Anayasa oluşum Sürecinde Anadil’de Eğitim sorunsalı”, r. 162.

10 Mela Birhanê Tarînî, *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyên Me*, r. 59.

siye: “Di dema seydayê Xanî de, ders Kurdî dihate gotin, lê çima niha nayê gotin?”¹¹ Dibe ku em henek cîyan de maf bidin Seydayê hêja, lêbelê Mela Birhan, muderris û ‘alimên ku medreseyan de ders dane ra henekî neheqîyê dike. Ger ku ew muderris û zanayên qedirbilind nebûna xwendin û xeberdana kurdî ne gengaz (mimkun) bu ku bi dewlemendî bihata roja îro. Dema mirow van salên dawîyê jî, di medreseyan rojhelat ku digere mirov dibîne ku perwerdehî dîsa piranî bi zimanê kurmançî tê dayînê. Ya rastîn Mela Birhan jî di pirtûka xwe de cîyekî din de vî mafî bixwe teslîm dike û Wuha dibêje: “Lê tiştek lazim e bê zikirkirin ku em nankoriyê nekin. Kî biçê feqîtiyê, cara pêşîn nezaketa xeberdanê û lezeta zimanê Kurdî li wir hîn dibe, pêşî jê re tê gotin, dema ku Seyda gazî te kir, jî dêvla ‘erê’, tu yê bibêjî, ‘lebê’ an jî ‘belê’ û gava bersîva te ‘na’ be, tu yê wiha bersiv bidî, bi zimanekî nerm û bi germî, bi lefzê ‘naxêr’ divê bersiv bê dayîn. Ango em li hucreyan ji gundîtiyê derdiketin û ber bi şaristanî-ya ‘ilm û bajarîtiyê ve diçûn.”¹² Di berdewamkirina çanda kurdên rojhelatda hebûna medreseyan cîyekî pir girîng girtîye. Xwendina qewl, destan, mewlûd, pirtûkên derbarê şîrê û hwd. li aliyê medreseyan pêk hatîye.¹³ Lêbelê kimasîyeke mezin jî hatiye hîştinê ku ew jî berhemên kurdî zêde nehatine amedekirin. Li seva vê rastîyê jî mirov dikare maf bide Mela Birhan.

Di perwerdehiya medreseyan da çend bêje hene û ew bêjeyan pir girîngên. Xwendevan bi literatura medreseyan da feqe mecbûr e li gorî wan bêjeyan hereket bike. Ew bêjeyan evin: *mutalaa*, *muzakere* û *teqrîr*.

Mutalaa: Wate (mena) ya mutalaa-yê, xwendina bi çavkanîyên ku bibe alikariya dersên ku paşê were hildanê. Feqe berhemên cuda ku têkiliyên wan bi dersên wî ra hebe dixwîne. Mutalaa-yêda xwendevan bi serê xwe bixwe dixwîne.

Muzakere: Xwendina xwendevan ê ku ders a xwendîye an jî berhemeke ku hez bike ku lê binhêre, yekî ku asta wî da be an jî ji asta wî bilindtir ra bi hev ra xwendinê ra tê gotinê.¹⁴ Xwendevanên “dersên ku xwendine ji hev re dibêjin û dibin alîkar ji bo famkirin û tehlîla wan.”¹⁵ Muzakereyêda xwendevan bi yekî din re dixwîne. Mela Xelil Çiçek, der barê muzakereyêda wuha dibêje: “Muzakere wuha dihate kirinê: du

11 Mela Birhanê Tarîni, *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyan Me*, r. 89.

12 Mela Birhanê Tarîni, *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyan Me*, r. 93.

13 “Yakın Tarihimizde Doğu ve Güneydoğu Anadolu Bölgelerinde Din Eğitiminin Rolü”, r. 210- 211.

14 Halil Çiçek, “Yakın Tarihimizde Doğu ve Güneydoğu Anadolu Bölgelerinde Din Eğitiminin Rolü”, 205-206.

15 Mela Birhanê Tarîni, *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyan Me*, r. 44.

xwendevan ku astekîda bin bi hevra li hev îstîfade dikirin. Herdukan bi hev ra îbare dixwendin û wate (mêne) ya wî 'îbare didanê û qerf (nukte) ên nû lê digirtin. Der barê wê mijarê pirs û rexne li hev ra dikirin."¹⁶

Teqrîr: "Xwendevan (feqe) û mamoste (Seyda) dinêrin yan wek pirtûkan yan jî pirtûkên cuda. Bi piranî mamoste, bi caran jî xwendevan 'îbareyê dixwîne û mamoste dengêkî bi vasat, bi hevok hevok, bi zimanekî ku xwendevan herî rind pê femdike Tirkî an jî Kurdî, car caran jî herêmê da cîyên ku Zazakî û 'Erebî tên xeberdanê li van zimanan xwendevan kêjan zimanî bizanibe, mamoste li wî zimanî dersê teqrîr dîke."¹⁷

Ji bo ku mijara me rind weçe têgihiştinê, me bi zanebûn behsa van her sê bêjeyankir. Di medreseya li der barê perwerdehiya bi zimanê kurdî da dibe *mutalaa* bi mînak neyê dayîn, lêbelê her du bêjeyin din piştgiriyê dide doz a me ya ku di medreseya der barê perwerdehiya bi zimanê kurdî da. Heke ku xwendevan ku pirtûkên xwerû kurdî bixwîne -mînak 'Eqîda Îmanê, Nehcu'l- Enam- mutalaa ya wî jî, bi gumaneke (ihtimal) mezin diya bi zimanê kurdî dibe. Heke pirtûkê rêzê, yê din be, ango 'erebî be, wê demê mutalaa jî diya zimanê 'Erebî dibe. Lê muzakere û teqrîr ne wekî mutalaa ye. Çawa ku me salixê muzakere û teqrîrêda anî ziman ku muzakere û teqrîr herî kêr navbera du kesan da çêdibe. Ev her du kes hev re pirs û bersîva dibêjin. Xeberdana navbera van her du mirovan mixabin ne 'Erebî ye, dibe car caran û hinek cîyan bi 'Erebî çêdibe, lêbelê pirayî bi kurdî an jî bi tirkî çêdibe.

Her çiqas kevneşopa medreseyan bi hinek sedeman roj bi roj kêmbûne jî, hê niha di medreseya der barê perwerdehiya bi zimanê kurdî tê dayînê. Vî perwerdehiyê de him pirtûkên xwerû kurdî him pirtûkê kurdî û 'erebî û him jî pirtûkên 'erebî bi zimanê kurdî hatiye dayîn û hê tê dayînê.

Dema kesên ku hate medresê piştî xwendin a Qur'an a Piroz derbasê *Mewlûd a Şerîf* a navdar ya Mele Hesen ê Ertûşî (1417-1491) dibe. Seyda bi navê Melayê Batê meşhur bûye. Ev berhema hanê a bêhempa, dayîkbûna Rasûl ê Xwedê bi şewazeke wêjeyî bi kurdî dîne ziman. Piştî dîrsa mewlûdê, xwendekarê medresê- bi literatura medreseya "feqe"- derbasê xwendina berhemeke din dibe. Ev berhema yekta -berhema seyda, feylezof û wêjemendê navdar Ehmedê Xanî (1651-1707)- *Nûbihare*.

16 Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 88.

17 Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 78.

Xanî ê rehmetî vê berhema xwe da valahiyeke pir mezin tijîkiriye û pêşkeşê seyda û feqeyan kirîye. Wan rojan heya îro di medreseyên rojhelatda seva fêrbuna ziman, serê perwerdehiyêda eva pirtûka hanê tê xwendinê û feqe guvaguya hînê zimanê ‘erebî û kurdî dibe. Seyda ser vê mijarê wuha dibêje:

*“Ji paş hemd û selewatan,
Ev çend kelîme jî ji luğâtan.
Vêk êxistin Ehmedê Xanî,
Navê Nubihara biçûkan danî.
Ne ji bo sahib- rewacan,
Belkî ji bo piçukê di kurmancan.”¹⁸*

Di medreseyên rojhelatda bilî van pirtukan hinek pirtûkên kurdî jî tên xwendinê. Wekî mînak: Eqîda Îmanê, Eqîda Îslamê û Nehcu’l- Enam. Herdu pirtûkên sere-tayî dîsan yên Seydayê Ehmedê Xaniye û pirtûka siyemin jî ya seyadayê binavûdeng Mele Xelîlê Sêrdîye (1754-1843). Ew pirtûkanan li derheqê bawerî (eqîde) û rewîştê (exlaq) hatinen nivîsandin.

“Di medreseyên Rojhelatda,“ Rêzimana ‘Erebî, şertên Îslâmê, Felsefa Îslâmê, arî-metik û şer’at (dad/hiqûq) bi ‘Erebî tên xwendinê. Hînbûn û berkirêna Quran a Pîroz binyade, bingehe. Nimêj, ‘îbadet û derindêz (merasîm) ên olî bi ‘Erebîne. Zi-manê kurdî seva ev pirtûkên hanê ên ku xwendina wan giranên ku werên xwendin û fehmkirinê tê xebitandinê. Di perwerdehiyêda xwendina pirtûkên kurdî pêwîstî-yeke, seva pirtûkên ‘erebî ên ku xwendin û fehmkirina wan pir giranên ku werên fehmkirinê. Ev pirtûkên kurdî yên herî gihastî, Mewlûd a kurmancî, Nûbihara Eh-medê Xanî a ku ferhenga kurdî û erebî ye û pirtûkên ku Mela Yunîs, ku li ser rêzima-na ‘erebî bi kurmancî nivîsiye, *Tasrîf*¹⁹, *Terkîp û Zurûf* ên.”²⁰ Piştê van gotinan emê hinekî behsa van berheman û nivîskarên wan bikin.

18 Hamd ve salâvattan sonra (Çeviren, Metin Yıldız)/ İşte dillerden bu kelimeler/ Ehmedê Xanî tarafından derlenmiş/ İlk meyveler ismi konulmuş/ Görgülü, bilgililer için değil/ Kürt çocukları için yazılmış. (Çeviren, Mehmet Uzun, *Kürt edebiyatına Giriş*, s. 27.)

19 Ev berhema hanê ne ya Melâ Yunîs e. Tê gotin ku ev berhem ya Mela ‘Eli et- Teramîhî ye. Bnr. Halil Çiçek, Şark Medreselerinin Serencâmı, r. 34 ê da têbinî ya 17

20 Mehmet Uzun, *Kürt Edebiyatına Giriş*, r. 36.

Seydayê Mela Xelil Siirdî (1167/ 1754- 1259/ 1843): Di Hîzanê sala 1754 a da ji dayik buye û sala 1843 yan da çuye ber rihma Xwedê (c.c)²¹. Çawa ku tê gotinê, Seydayê Mela Xelil di destpêka perwerdehiya xwe da buye mazharê di'ayê Şêx İbrahim Heqqî. Seydayê Mela Xelil piştê perwerdehiya xwe ya li herêma xwe temam dike derbasê Si'irdê dibe û wê derê 'îqamet dike. Seydaye Mela Xelil jîyana xwe di warê 'ilmî û nivîsandinê da derbaskirîye.²² Seydayê Mela Xelil Siirdî di nava berhemên ku amadekirîye da "*Nehcu'l- Enâm û Tecwîd û Mewlûd* bi Kurdî nivîsiye. Berhemên wî di ser 30 pirtûkî re hene, lê heta niha nehatine çapkirin."²³

Mela Yûnisê Arkatanî: "Mela Yûnis di warê wêjeya 'Erebî de, bi Kurdî du pirtûkên ku di nava rêza dersan de cî digirin nivîsine, navên wan *Terkîp û Zurûf* in."²⁴ Der barê jîyana Mela Yûnisê Arkatanî de mixabin tu agahî tune. Mela Xelil Çiçek dibêje ku nivîskarê pirtûka *Terkîp û Zurûf* ne diyare, lêbelê li bal medreseyiyan de tê hesibandinê ku ev her du berhem yên Mela Yûnisê Arkatanîye.²⁵

Seydayê Ehmedê Xanî (1119/ 1707): Seydayê Ehmedê Xanî di sala 1651 î da ji dayik buye. Nisbeya wî, ji gundekî nîzikê Colemêrgê ku navê wî Xan e an jî eşîreta Xanî tê. Seydayê Ehmedê Xanî him tadrîsa wê dewrê ku medreseyan hatîye dayîn hildaye him jî ser astronomiyê ders hildaye. Şêx Ehmedê Xanî li Cizîra Botan jî maye û pirtûka xwe ya navdar *Mem û Zîn* li wira nivîsiye û derbasê Bazîdê buye û wêderê jîyana wî qedîya ye, 1707'an da çuye ber rihma Xwedê (c.c). Ku mirov berhemên wî ên Kurmancî dinihêre, dibîne ku ew helbestvan û şairekî girîng e. Şêx Ehmedê Xanî di berhemên xwe de behsa uluhiyyetê, meseleyên wucûd (hebûn) ê kirîye. Bili van mijaran, Şêx Ehmedê Xanî li ser mijarên rewîştî (exlaq), çandî û civakî jî sekiniye.²⁶ "Ehmedê Xanî hosteyekî wêjeyêye. Giringiya Shakespeare, Cervantes, Dante û Ferdows di warê ziman, wêje û çandên xwe da çibe, di warê ziman, wêje û çanda kurdi da Ehmedê Xanî jî wusaye."²⁷

21 Derbarê diroka dayikbuna Mela Xelil Siirdî da riwayeteke din da ji 1750 tê gotinê. Derbarê jîyan û berhemên Mela Xelil Siirdî bnr. Necdet Karakaya, *Bir Dilci Olarak Molla Halil es-Siirdî, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Wan, 2006*, Tez a mastirê a nehatiye çapkirinê.

22 Ehmed Hilmî el- Koxî ed- Diyarbekrî, *Rehberê 'Evâm Şerha Nehcu'l- Enâm*, r. 78.

23 Mela Birhanê Tarîni, *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyên Me*, r. 65.

24 Mela Birhanê Tarîni, *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyên Me*, r. 65.

25 Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 51.

26 M. Said Özervarlı, "Hanî, Şeyh Ahmed", *TDV. İslâm Ansiklopedisi*, C. XVI, r. 31-32.

27 Mehmet Uzun, *Kürt Edebiyatına Giriş*, r. 25.

Çend Berhemên Kurdî Ên Bijarte:

Mewlûda Nebî: Ev berhema hanê bi zimanê Kurdî bi zaravaya Kurmancî hatiye nivîsandinê. Nivîskarê vê pirtûkê Mele Hesenê Ertuşî (1417/ 1491) ye. Mela, bi navê Mele Ehmedê Batê navdar buye. Mela, vî pirtûka xwe da bi zimanekî binazmî û xweşik behsa dayîkbûna Rasulullah (s.x.s) dike.

Nûbihara Biçûkan: Ferhengeke menzûmî û bi ‘Erebî û Kurdî ye. Di sala 1683 yan da li pêûsa Şêx Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsandinê. Di despêka vê berhemê da Şêx Ehmedê Xanî dibêje ku zarokên ku Xandina Qur’an a Pîroz qedandine ji wan ra seva dersên Serf û Nehwê hêsanî bike ji boy wî ewî, ev pirtûka hanê amade kirîye. Seyda wuha dibêje:

“Ne ji bo sahib- rewacan/ Belkî ji bo piçukê di kurmancan.

Wekî ji Quranê xelâs bin/ Lazime li sewadê çav nasbin.”

Seydayê Ehmedê Xanî ev berhema xwe ya bi nav û dend, bi hunera arûzê va amadekirîye û pêşkeşê xwendevanan kirîye. Seyda ev pirtûka xwe bi beşan ve û bi serê her beşekîda jî beyteke pir watedar nivîsiye. Mînak:

“Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf,

Di dinyayê tu nabî ne meşhûr ne mîrûf.”

“Şeyx û sufitî keramet, ‘ilim xwendin hem ‘emel

Xilwete hucra terîqa te şerîet bê xelet.”

Seydayê Ehmedê Xanî, piştê hemd û senayan û destpikê, bi navê Xwedê (c.c.) û Resûlê Wî va dest pê nivîsandinê dike û jiyana Resûlullah (s.x.s) dide hînkirinê. “*Xudê Ellâh e, qasid resûl e ey Xudê zân.*” Emê bi kurtasî behsa çend mijarên vê berhema bêhempa bikin û derbasê berhemeke din bibin. Seydayê Ehmedê Xanî, lebat (uzuv) ê mirovan, xwerin û wexwerinê û hestê xwerinê, navê bav, dê, mîr, jin, bira, keç... û hwd. dide hînkirinê.

Ev berhema Seyda ne bi tenê ferhengeke xwerû bêtî ye. Seyda vê berhema xwe de him wergerandina navan him ya cînav (zamîr) an him ya fî’lan him jî ya hevokan dide hînkirinê. “*Hatim eteytu, âtî tîm, wî hat etâ, îti were.*”

Femâ xatbukum eyyuhe'l- murselîn/ Gelî qasidan bo çi hatine hûn.

Digel min me'î, digel te me'ek/ we lî hem ji bo min, ji bo te we lek.

Vê pirtûka Seyda da tişteki dinê balkêş bala me kişand ku ew jî pêwiste were ziman: Pirtûkeke destpêki da behsa 'enasîr-i erbe'a tê kirinê. Seydayê merhûm zarokan hîne fêrbûna xweza (tabîat/fizik) yê dike.

"Bizan çar ên 'enasîr: ax û av û ba û agir hem,

Mewâlîd ev e her sê: nebat û mîden û heywan."

Li ser vê berhem a bêhempa li bal Ehmed Hilmî el- Koxî ed- Diyarbekrî şerheke delâl bi navê "*Gulzârâ Hemûkan Şerha Nûbihara Biçûkan*" hatîye nivîsandinê.

'Eqîda Îmanê: Ev pirtûka hanê jî ya Seydayê Ehmedê Xanî ye. Şêx Ehmedê Xanî vê pirtûka xwe da behsa bingehên îmanê û mijarên 'eqîdeyên din li gor ehli's- Sunnetê bitaybetî li gor mezheba 'Eş'arîtêye dike. Ev berhema hanê rîsaleyeke piçûke û bi nazmî ye. Çend mijarên vê pirtûkê evên: Tewhîd, Nubuvvet, sîfatên Xudê, kozmolojî (teb'iyât/xezâyî), şefe'at, dî'a û hwd. Seydayê Ehmedê Xanî ev berhema xwe li gor mezheba Eş'arî nivîsiye, lê belê derheqê pêxemberîya jinan da li gor Matûrîdiyayan fikr û ramana xwe nîşandike. Seyda derheq vê mijarêda li dijî 'Eş'ar'îyan dibêje ku jin nabên pêxember.²⁸

'Eqîda îmanê bi pênc şertên Îslamê va destpêdike û piştê derbasê şertê îmanê dibe. Seydayê Ehmedê Xanî şeş bingehên îmanê yek bi yek nivîsiye. Seyda, behsa lefzetullahê û cudahiya navbera Xalîq û mexlûqan dike. Seydayê Ehmedê Xanî derbarê sîfatên Xweda da "Tekwîn"ê nabêje û wekî Ehl-i's- Sunnetê dibêje ku sîfat ne wekî Xwedêye ne jî xeyrê Xwedêye. Seydayê Ehmedê Xanî milyaketan wuha şayeser (teswîr) dike: "*cewherin, nuranîne, cismê letîfên*" Seyda behsa nîşanên rakirina qiyametê dike û paşê jî wuha didomîne: "*Hemî heqîn bêşek dê biqewimin. Mexlûq dê rabin bihev bikevin dê biçin erdê Şamê.*" Seyda, behsa ehwalên exîretê û mehder (şefa'at) a Pêxemberan, meşayîx û salixan dike. Li gor Seydayê Ehmedê Xanî jî, qeder bi teqdîra Xwedê (c.c.) ye. Seyda Wuha dibêje:

28 M. Said Özervarlı, "Hanî, Şeyh Ahmed", r. 32.

“ji ewel heta âxir heçî vaq’î bibit,

Dê muvafiqê wî nivîsê bit.

Mexlûq sebebê ‘emelê îxtiyarî ye,

Herwekî agir sebebe ji bo şewtandinê.”

Şerha vê pirtûka hanê ya ku rûpelên wî ku hindik, lê naveroka wî pir dewlemend, li bal Ehmed Hilmî el- Koxî ed- Diyarbekrî bi navê *Rehbera Sanî Şerha ‘Eqîda Şêx Ehmed b. Îlyâs el-Xanî* va hatiye nivîsandinê.²⁹

Nehcu’l- Enam: “Lêbelê hêja ye em bibêjin ku Seydayê Mela Xelîl bi nivîsandina berhemên xwe şoreşek xiste nava medreseyan. Lewra piştî ku pirtûk çêkir, êdî di medreseyên Botan, Serhed û deşt û çiyayan de, pirtûkên wî xwe xistên nava pirtûkên rêzê yên xwendinê û êdî meleyan dest avîtin xwendina pirtûkê wî yên *camî’ û manî*”³⁰

Seydayê Mela Xelîl vê berhema xwe ya pir girîng da behsa îman û rewîştê (exlaq) dike. Naveroka pirtûkê an jî sernavên vê pirtûkê Wuhaye: Behsa ferzê ‘eyn, îlahîyat, nubuvvet, âxîret, îmamet, perwerdehîya ji bo rêya Xwedê, lebat (uzuv) ên mirovan, âdab a xwerinê, cil û bergan.

Seyda, destpêka vê pirtûka xwe da -wekî Şêx Ehmedê Xanî ku çawa di pirtûka xwe ya ‘Eqîda Îmanê da yekem behsa şertên îslamê dike- şert û mercên Îslamê dide nasîn û mijara bawerîyê jî pey wî dîne ziman. Seydayê Mela Xelîl derbarê îman û îqrarê va dibêje ku, îman û îqrara îmanê hev ra ne û şert e jî. Mela dibê, bawerîya kelîmeyê şehadetê mirovan durê kufre dike. Seyda, li ser têkiliya îman û ‘emelê jî disekine.

Berîya ku xwendevan derbasê pirtûkên rêzê be ev berhemên me behsa wan kir têne xwendinê. Armanca xwendina van berheman li gorî Mela Xelîl Çiçek, him benekîyên xwendina xwendevanan qewî kirine, him jî xwendevana biderûnî xwendinê amadekirine û him jî ji bo zanebuna xwendevanên nû der barê olê de pêşta birine.³¹ Ev berhemên hanê kû kurmancîne li xwendevanên nû ra xwendin, femkirin û

29 M. Said Özervarlı, “Hanî, Şeyh Ahmed”, r. 32.

30 Mela Birhanê Tarîni, *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyên Me*, r. 99.

31 Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 47.

berkirina van pir hêsan e. Di medreseya pirtûkên bi kurmancî xwendinê hetanî Şerhu'l- Muğniyê dewam dike.³²

Armancên nivîskarên van pirtûkan û seydayên van pirtûkan didin xwendinê, feqeyên destpêka perwerdehiya medresê fêrê bawerî û rewîştîyî (exlaq) bikin.

Encam:

Di encamêda em dikarin ku bibêjin, di medreyên rojhelatda perwerdehî piranî bi zimanê kurdî hatiye dayînê û van salên dawiyê da jî dîsa zefayî bi kurdî tê dayînê û ev jî nebûye sedemên pisgrîkan, berevajî bûye navgîna dilfirehî û aramîyê.

Muderrîs û xwendevan, şîrovekirina pirtûkên ku perwerdehî pê tê kirinê bi zimanê kurdî dikin. Perwerdehiya di nav medreyanda çawa ku xwendevan serîda, gelên dev dora medreyan perwerde kirîye, roja îro jî bi nihêrandineke erênî dîsa gengaz (mimkun)-e ku rist (wezîfe) a xwe bîne cî. Zimanê ku di perwerdehiya medreyanda heta roja îro ku çawa berdewam kirîye, dîsa gengaze were berdewamkirinê.

Di dîrok a Îslâmêda medrese cîyên 'ilm û şaristanîyê buye û rist a xwe ya girîngî rind leyistîye. Em dikarên bibêjin ku zimanên perwerdehiya van medreyên rojhelatda, zimanên şaristanîyê û perwerdehiya hemdemêda jî gengaze werin bikanîne.

ÇAVKANÎ

Çiçek, Halil, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, Beyan Yayınları, İstanbul, 2009.

____ "Yakın Tarihimizde Doğu ve Güneydoğu Anadolu Bölgelerinde Din Eğitiminin Rolü", *Sosyal Bilimler Kavşağında Doğu Anadolu Sempozyumu*, 1999, Van, di nav pirtûka *Şark Medreselerinin Serencâmı*.

el- Koxî ed- Dîyarbekrî, Ehmed Hilmî, *Rehberê 'Evâm Şerha Nehcu'l- Enâm*.

Karakaya, Necdet, *Bir Dilci Olarak Molla Halil es-Siirdi*, Zanîngeha Yüzüncü Yilê, Wan, 2006, Tez a mastirê a nehatiye çapkirinê.

Mela Xelilê Siirdî, *Nehcu'l- Enam*.

Özerveranlı, M. Said, "Hanî, Şeyh Ahmed", *TDV. İslâm Ansiklopedisi*, C. XVI.

Postacı, Hasan, "Yeni Anayasa oluşum Sürecinde Anadil'de Eğitim sorunsalı", *Bilge Adamlar*, Hejmar 28, Sibet, 2012.

Tarîni, Mela Birhanê, *Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreyên Me*, Şin, Ankara, 2011.

Uzun, Mehmet, *Kürt Edebiyatına Giriş*, İthakî Yayınları, İstanbul, 2007.

Xanî, Seydayê Ehmedê, *'Eqîda İmanê*.

____ *Nûbehara Biçûkan*.

32 Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, r. 47.